

Civaka Eşîrê û Rewşa Trajîk di Romana Yılanı Öldürseler a Yaşar Kemal da¹

Yaşar Kemal'in Yılanı Öldürseler Romanında Aşîret Tolumu ve Trajîk Durum
Tribal Society and Tragic Situation in Yaşar Kemal's novel Yılanı Öldürseler

Mehmet Nur YAVUZER

Mehmet Nur YAVUZER	Mehmet Nur Yavuzer https://orcid.org/0000-0002-5648-5743 mehmetroniyavuzer@gmail.com Dr. Milli Eğitim Bakanlığı, Van - Türkiye
Jêgir Citation Atıf	Yavuzer, M.N. (2024). Civaka Eşîrê û Rewşa Trajîk di Romana Yılanı Öldürseler a Yaşar Kemal da. <i>Artuklu Kurdology</i> (17). 07-18
Diroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi	22.08.2024
Diroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi	28.09.2024
Diroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi	30.09.2024
Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü	Gotara vekolînê Research article Araştırma makalesi
Hakemî Peer-Review Hakemlik	Cot Nenas – Du ji derve Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı	Hatîye beyankirin ku di pêkanî û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopan- dîn û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
Kontrola İntihalê Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	Belê – iThenticate <i>Yes – iThenticate</i> Evet – iThenticate
Nakokiyên Berjewendîyan Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye. <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
Alîkarîya Darayî Grant Support Maddî Destek	Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine. <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
Mafê Telifê & Destûr Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin. <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

1 Ev gotar ji sudwergirtina ji teza doktorayê ya nivîskar ya bi navê “Nasname û Rewşa Trajîk: Berawirdkirinek Li Ser Romanên Mehmed Uzun, Yaşar Kemal û İbrahim Yûnisi” hatiye amadekirin.
This article is produced from the author's Ph.D thesis titled “Identity and Tragic Situation: An Comparison on the Novels of Mehmed Uzun, Yasar Kemal and Ibrahim Yunisi”

KURTE

Yaşar Kemal mîna nivîskarên trajedîyan ji rewşa trajîk têdigihîje ya ku di puxtêya jîyanê da heye û wê di cureya romanê da diceribîne ku yek ji wan, romana *Yılanı Öldürseler* e. Ew, di vê romanê da ji rûdaneke ku hatiye jîyîn sûd werdigire û wê vediguhêzîne cîhana honakê. Berhemên ku rewşa trajîk a jîyanê radigihînin hêmanên berberî, hîlbijartin, çalakî, êş û wêranîyê dihewînin. Kemal rewşa trajîk a vê romanê li ser bîngeha berberî, êş û wêranîya meriv û civakên eşîrê yê sedesala 20em yê ku koçê Çukurovayê kirine, saz dike ku meriv û civaka Kurd parçeyên wê yê herî giring in. Ew di vê romanê da di navbera takekes û civakê da berberîyekê ava dike. Ew, nasnameya karakterên xwe di nav pergala zayendî ya eşîrê da ava dike û karakterên romanê di navbera nîrx û zagonên civakê, hest û helwestên wan ên takekesî da dixê nav berberîyekê. Kemal bi vê romanê ji alîyê va rewşa trajîk a jîyanê bi xwîneran va dide têgihîştinê ji alîyê din va jî rewşa trajîk a meriv û civakên ku hilgîrên nîrxên eşîrê ne û bi zagonên eşîrê va hatine dorpeçkirin, pêşkeş dike.

Bêjeyên Sereke: Yaşar Kemal, Roman, Yılanı Öldürseler, Civaka eşîrê, Rewşa trajîk.

ÖZ

Yaşar Kemal, trajedi yazarları gibi hayatın trajik durumunu kavrar ve onu roman türünde dener ki onlardan biri *Yılanı Öldürseler* romanıdır. O, bu romanda gerçekte yaşanmış bir olaydan faydalanır ve onu kurgu dünyasına aktarır. Hayatın trajik durumunu yansıtan eserler, çatışma, seçim, eylem, acı ve yıkımı içerirler. Kemal, bu romandaki trajik durumu Çukurova'ya göç etmiş 20. yüzyıl aşiret insanı ve toplumunun yaşamış olduğu çatışma, acı ve yıkımı üzerine temellendirir ki Kürt insanı ve toplumu bunun önemli bir parçasıdır. O, *Yılanı Öldürseler* romanında toplum ve birey arasında bir çatışma inşa eder. Karakterlerin kimliklerini aşiret cinsel kimlik sistemi doğrultusunda çizer, onları toplumun değer ve kuralları ile bireysel duygu ve tutumları arasında bir çatışmaya sokar. O, bu roman ile bir taraftan hayatın trajik durumunu okura kavratır, diğer yandan da aşiret değer taşıyıcıları ve aşiret normları ile kuşatılmış aşiret insan ve toplumunun yaşadığı trajik durumu aktarır.

Anhtar Kelimeler: Yaşar Kemal, Roman, Yılanı Öldürseler, Aşiret toplumu, Trajik durum.

ABSTRACT

Yaşar Kemal, like tragedy writers, grasps the tragic situation of life and tries it out in the novel genre, one of which is the novel *Yılanı Öldürseler*. In this novel, he utilizes an event that actually happened and transfers it to the world of fiction. Works that reflect the tragic situation of life include conflict, choice, action, pain and destruction. Kemal bases the tragic situation in this novel on the conflict, pain and destruction experienced by 20th century tribal people and society who migrated to Çukurova, of which Kurdish people and society are an important part. In his novel *Yılanı Öldürseler*, he constructs a conflict between society and the individual. He draws the identities of the characters in line with the tribal sexual identity system and puts them in a conflict between the values and rules of society and their individual feelings and attitudes. With this novel, he, on the one hand, makes the reader comprehend the tragic situation of life and, on the other hand, conveys the tragic situation of tribal people and society surrounded by tribal value carriers and tribal norms.

Keywords: Yaşar Kemal, Novel, Yılanı Öldürseler, Tribal society, Tragic situation.

Destpêk

Hevparîya roman û trajedîyê ev e ku her du form jî rewşên trajîk dihewîne. Wek cureyeke edebî roman di serdema nûjen da geşe dide ku di vê serdemê da trajedî lawaz dibe. “Henri Peyre û hin rexnegirên din, romanê wekî berpirsiyarê mirina tragedyayê dibînin. Bi wan, romanê esasên hestgermî yê trajîkê erzan kir, rehn kir û hilda bin destên xwe” (Henri Peyre, 1955, r. 77; vgz. Eagleton, 2012, r. 239). Wek romanûsê edebîyata cihanê Yaşar Kemal, di romanên xwe da cih dide honakên trajîk ku yek ji wan romana *Yılanı Öldürseler* (Mar Bikuştina)² e. Kemal vê romanê di atmosfera trajedîyê da dihûne. Ev roman, mîna trajedîyên klasîk, xwe dispêre hêmanên mîtîk û rûdanên awarte. Di heman demê da axaftinên biaheng yê gundîyên romanê û gotegotên wan, koro û fonksiyona wê bi bîr dixe. Herwiha, ew di hunerên dîtbarîyê, yê sînema û şanoyê da jî derdixe pêşberî bîneran (Çiftlikçi, 1993, r. 253).

Di navbera berhema hunerê û jîyanê da pêwendîyeke xurt heye. Kemal, mijara romana *Yılanı Öldürseler* ji rûdaneke ku hatiye jîyîn werdigire ku bi vê jî xwe dispêre rûdaneke rast û wê ji nû va dihûne. Aristoteles, li ser têkilîya jîyana rastî û hunerê radiweste û bi wî, huner zarîkirin e (2017, r.19). Auerbach, li ser *mimesis*ê radiweste û *mimesis*ê “ji xêncî wateya wê ya zarîkirin û kopîkirinê, bi awayekî edebî, ji nû va hilberandina jîyana rojane, ango wek temsîla rastîbînîyê dibîne” (Göbenli, 2021, r. 63). Çawa ku Auerbach (2019, r.46) tîne ziman “di edebîyata nûjen da ...her kes û her rûdan, bi hunera temsîlê, bi awayekî jidil, bipirsgirêk û di forma trajîk da dikare bê realîzekirin, jixwe tîn kirin jî”, Kemal di vê romanê da rûdaneke rast bi hunera temsîlê û di forma trajîkê da realîze dike. “Roman ...rastîyê wek materyal bi kar tîne, wê xerab dike û vediguherîne” (Sağlık, 1998, r.72) ku “Kemal, bi hunera xwe ji vê rûdanê bi navê *Yılanı Öldürseler* trajedîyeke nûjen derdixe” (Çiftlikçi, 1993, r.253).

1. Jîyana Yaşar Kemal

Yaşar Kemal di sala 1923yê da li gundê Hamiteyê (bi navê niha Gökçedam) ji dayîk dibe (Kemal, 2008, r.1). Malbata wî di Şerê Cihanê yê Yekem da ji ber dagirkirina Rûsan, ji gundê Ernêsê direvin ku ew li peravê Deryaçeya Wanê ye, di encama koçeke dirêj da li gundê Hamite ya ku nêzikî Adanayê ye bi cih dibin (Kemal, 2021, r.1). Ew, li vir tê cihanê, mezin dibe û diçe xwendîgehê. Ew, ji ber xizanîyê, hem dixebite û hem jî dixwîne (Kemal, 2008, r.1). Yaşar Kemal, çiraxtîya solan, tûpçîtî, ajokariya traktorê, karmendîya İETTê ya gaza hewayî, daxwaznamenivîsî, mamostetîya wekilî û nûçegihanîyê dike (Akbayır, 2018, rr. 9-17). Ew, di serê salên 1940î da bi hunermend û nivîskarên çepgir yê wekî Pertev Naili Boratav, Abidin Dino û Arif Dino têkilî datîne; di 17 salîya xwe da ji ber sedemên siyasî, dikeve girtîgehê (Kemal, 2021, r.1). Di sala 1950î da li Çukurovayê dibe damezirînekî Partîya Komînîst. Ji ber vê jî tê girtin. Dema ku ew di girtîgehê da ye, girseyeke mezin ji bo ku wî bikujin, êrişî girtîgehê dikin, jandarma wî direvînin û ji kuştinê xelas dikin. Di sala 1951ê da dema ku ji girtîgehê derdikeve ji ber gefa li ser xwe, berê xwe dide Stenbol (Saklıyan, 2019, rr. 25-27). Li Stenbolê di rojnameya *Cumhuriyet*ê da wek nivîskarê roportaj û metelokê kar dike. Di sala 1952yê da pirtûka yekem a kurteçirokan *Sarı Sıcak*, di sala 1955ê da jî romana wî ya *İnce Memed* diweşin ku *İnce Memed* heta niha bi qasî 40 zimanan va hatiye wergerandin (Kemal, 2021, r.1). Ew ji ber nivîs û çalakîyên siyasî gelek caran rastî teqîbat û lêpîrsînê tê. Di sala 1973yê da dibe serokê Sendikaya Yekitîya Nivîskarên Tirkîyeyê. Di sala 1988ê da dibe serokê yekem yê Komeleya Nivîskarên PENê. Di sala 1995ê da ji ber nivîseke xwe ya ku di *Der Spiegel*ê hate weşandinê di DGM yê da tê darizandin û beraet dike. Di heman salê da ji ber nivîsa “Ewrên Reş Yê li Ser Tirkîyeyê” ji salekê heta 8 salan ceza digire. Lê piştra cezayê wî paşda tê avêtin (Kemal, 2008, r.1). Berhemên wî ji 40î zêdetir zimanan va hatine wergerandin. Ew bi hunera xwe ya resen bes ne li Tirkîyeyê, di heman demê da di edebîyata

2 Di Kurmancî da zayenda peyva “mar” nêr e lê di romanê de bi qesta karaktera jin hatiye bikaranîn. Em ê jî vê peyvê bi zayenda mê, bi kar bînin.

cihanê da navekî sereke ye. Kemal ji sala 1973yê şûn da endamê xelata Nobelê ye. Ew di sala 2015yê da jîyana xwe ji dest dide (Kemal, 2021, r.1 ; Kemal, 2008, r.1).

2. Civaka Eşîrê û Rewşa Trajîk di Romana *Yılanı Öldürseler a Yaşar Kemal* da

Honak, ji hêza xeyalî ya romannûs pêk tê ku di vê romanê da hêzeke xeyalî ya xurt tê dîtin. Di honakê da yek ji hêmanên giring honaka rûdanê ye. Dema ku di lêkolînekê da li ser trajîkê tê rewastan, berhema *Poetikayê* ya Aristoteles, wek referanseke giring derdikeve pêş. Aristoteles (2017, rr. 30-31, 42) di nav hêmanên tragedyayê da ya giringtir “honaka rûdanê” dibîne, ango bi wî ya giringtir rêzkirin û birêkûpêkirina rûdanan e. Bi heman awayî honaka rûdanê ji bo cureya romanê jî hêmaneke giring e ku Kemal rûdanan bi têkilîya sedem û encam li hev girêdide. Ew, hezkirinê ku ew ji bo meriv hest û nirxek e, datîne li hemberî kevneşopên civakî, bi vî awayî li ser berberîya wan, rewşa trajîk saz dike. Di deqên trajîk da bawerkerî û karîgerîya trajîk giring in ku nivîskar ji serpêhatîyeke rast, rêzebûyerên bawerker û karîger saz dike, bi vî awayî karîgerîya trajîk pêk tîne.

Kemal di vê romanê da li dorhêleke civaka eşîrê, honaka rûdanê saz dike. Ew, bi bergeheke civaknasî û derûnnasîyê romanê dihûne. Dema ku honaka rûdanê ya vê romanê tê nêrîn, tê dîtin ku di romanê da Esmê keçeke xama û pir bedew e. Dilê her kesî dikevê, lê ew ji Abbas hez dike. Abbas dikeve girtîgehê. Halil tê destdirêjîya (tecawiz) Esmeyê dike û bi darê zorê wê dike hevîna xwe. Esmê bi derûnîyeke xerab, demeke dirêj naaxive, heta ku kurek jê ra tê dinê. Navê kurik datînin Hasan. Abbas ji girtîgehê derdikeve tê, ew û Esmê bi dizî çend caran hev dibînin ku Halil pê dihesê. Bi jandarmayan bi pey Abbas dikevin. Rojekê Abbas tê Halil dikuje. Esmê, berpîrsîyara vê kuştinê tê dîtin. Malbata Halil, pêşîyê dikin ku Hasan ji Esmeyê bistînin û Esmeyê ji gund derxînin. Gefan li Esmeyê dixwin lê ew dest ji kurê xwe nakişîne. Piştra dikin ku Esmeyê bikujin yan jî bidin kuştinê. Kemal di nav rêzerûdan da di navbera evîn û namûsê, hezkirin û rûmeta malbatê da berberîyekê saz dike û karakterên sereke yê romanê, Esmê û Hasanê kurê wê, ber bi rewşa trajîk va dixijikîne.

Pêşvaçûna dîrokî nasnameya mêr û jinê hilberandiye û zayendîya civakî derxistiye holê. Jina nûjen li ser pêşvaçûnê karîger e lê jina kevneşopî, rol û statûya xwe pejirandiye û lê xwedî derketiye (Metin, 2011, r.91). Kemal di vê romanê da bi rewşa trajîk a ku saz dike, ji alîyekî va rewşa trajîk a jîyanê dide nişan û ji alîyê din va jî balê dikişîne li ser nasnameya jinê. Ev nasnameyeke ku ji alîyê civaka eşîrê, bi hişmendîya nêr va hatiye avakirin ku jin tê da asê mane, dûçarî eş û wêranîyê bûne. Kemal, karaktera xwe ya bi navê Esmê, wek hilgira nasnameya jinê, ya jina eşîrê, saz dike. Ew di romanê da nasnameya jinê ya eşîrê, wek nasnameyeke trajîk saz dike. Lewra, nasnameya ku saz dike di xwe da hêmana trajîk a giring, berberîyê dihewîne. Nasnameya jina eşîrê, nasnameyeke ne azad e. Jin di bin çavnêrîya malbat û civakê da ne ku ew hatine serkutkirin. Vê avanîyê, pêşîya tevger û biryarên azad a jinê girtiye. Nivîskar, rewşa trajîk a jina eşîrê pêşkeş dike, ya ku dike li ser pêyên xwe bisekine û dema ku ew bi helwest û çalakîyên xwe li dijî hêza civakê tevdigere, wêran dibe.

Paksoy (2011, r.26), tîne zimên ku tragedyayên antîk, bêyî şert û mercên civakî û dîrokî nikare bîn ravekirin ku bi heman awayî rewşa trajîk a vê romanê jî bi pêwendîya şert û mercên pergala civaka eşîrî, ya sedsala 20em, dikare bê ravekirin. Lewra, rûdan û berberîyên ku rû didin, bi avanîya vê civakê, herwiha bi pêkhatîyên serdemê va pêwend in. Civaka romanê koçber in ku ew hatine li Çukurovayê bi cih bûne. Ji avanîya vê civakê diyar e ku ew civakeke eşîrê ye. Beşeke civaka Çukurovayê Kurd in ku Alakom (2013, rr. 66-67) dibêje, hatina Kurdan a ber bi Çukurovayê va xwe dispêre demên berê. Ji ber şer, sirgûn, koç, şerên eşîran, pîrsgirêkên aborîyê û hwd. Kurd hatine li Çukurovayê cihûwar bûne. Di romanên Kemal da Kurdên ku hatine Çukurovayê, aramî û ewlehîya ku lê geriyane nedîtine. Wan, bi xwe ra têkilî, kevneşopî û zagonên eşîrê jî anîne wir. Dema ku em ji alîyê nasnameya neteweyî li civaka romana *Yılanı Öldürseler* dinihêrin, em dibînin ku beşeke vê civakê Kurd in. Kemal bi awayekî zelal diyar nekiribe jî em wisa têdîgihîjin ku Esmê Kurd e û Hasanê kurê

wî jî ji alîyê dayîkê va Kurd e, lê ji alîyê bavî va nasnameya wî ya neteweyî nehatiye dîyarkirin. “Esmê di Kurdî da Esmê ye” (97) ku wisa dîyar e, ji ber ku di Tirkî da tîpa “ê” tune, nivîskar tîpa “e”yê bi kar anîye û navê wê wek Esmê dîyar kiriye. Di romanê da Kürt Sülo behsa xalanên Hasan dike ku ew li pişt çîyayên dûr dimînin (Kemal, 2021, rr. 61-63). Em ji agahîyên romanê wisa têdigihîjin ku xalanên wî Kurd in û dema ku Hasan dikeve tengasîyê, dike ku xwe bigihîne xalanên xwe. Vegêr, di dema reva Hasan a ku li pey çareserîyekê digere û ji gund direve diçe ku xalanên xwe bibîne, behsa Kurdên Elewî dike. “Dibe ku niştecihên vî gundî Kurd bin. Dibe ku ew Kurdên Elewî bin. Kurdên Elewî mêrxas û merd in” (64). Herwiha, Alakom (2013, r.109) dîyar dike ku karakterên zarok yê romanê *Yılanı Öldürseler*, sêyîneya *Kimsecik* û *Yusufoçuk Yusuf*, Hasan, Mustafa û Yusuf Kurd in. Kemal di van romanên da li ser êş, pîrsgirêk û tîrsa zarokên Kurd radiweste. Herwiha, di van hersê karakterên zarok da şopên zarokatîya Kemal tê dîtin ku ew di hevpeyvînan xwe da dîyar dike (Kemal, 2019). Ew, di romana *Yılanı Öldürseler* da behsa ‘Lek’an dike, lê bi vê, behsa kîjan komê yan jî eşîrê dike em baş nizanin, bes em dikarin pêderxistînekê bikin. Di romanê da Abbasê dildarê Esmeyê, wek Lek hatiye dîyarkirin ku ev jî wek beşeke Kurdan, Lekên Kurd û eşîra Şêxbizîni, yê ku li Haymana, Çukurova û çend bajarên din dijîn û axavtina wan a Kurdî dişîbînin zaravayê Lekî, bi bîr dixê. “Herin heyfa xwe ji birayê Abbas, ji xizmên wî wergirin... Hûn ditirsin ji Lekan, ne wisa? Ji tîrsa ziravê we diqete ku hûn xwe li ser Lekan bixin” (Kemal, 2021, r.42). Bi vî awayî civaka ku karakterên sereke endamê wê ne, civakeke kevneşopî ye û civaka vê romanê hilgîrên van nîrx û zagonên vê civakê ne. “Hemû tiştên ku wek trajîk tên binavkirin di qad û têkilîya nîrxan da pêk tê. ...di cîhanê bê nîrx da ji trajedîyê nikare bê behskirin” (Scheler, 1919, r.244) ku ev civaka eşîrê, bi zagon, bawerî û nîrxên xwe, berberîya ku bîngeha rewşa trajîkê ava dike, pêk tîne.

Dema ku em berê xwe didin nasnameya Esmeyê ku nasname li ser kîbûn û jikubûnê radiweste, Esmê ji pişt çîyayên dûr e û endamê civakeke kevneşopî ye. Ew, jîneke xama û bi bedewîya xwe va navdar e. Nivîskar wê wek jîneke bedew û bi bengîn saz dike. “...jîna herî bedew a Çukurovayê, heta ya cîhanê bûye” (Kemal, 2021, r.10). Gelek kes dewa Esmeyê dikin lê di gundê Esmeyê da xortek bi navê Abbas heye ku ew û Esmê ji hev hez dikin. “Abbas, ji ber evîndarîya ku ji Esmeyê ra dihewand, dîn dibû. Esmê jî, ji ber evîndarîya ku ji Abbas ra dihewand, dîn dibû” (28). Di civakeke eşîrê da ji bo jînekê, bedewbûn, xwedîbûna hestên bi bengîn û evîndarbûn, xeternak in. Di vê civakê da ji her alî va desthilatê malbatê mêr e. Divê jîna vê civakê hestên xwe yê evîne veşêre û heke hewce bike, ji bo civak û malbatê, wan serkut bike. Esmê, wek bedeneke ku mêr li ser şer dikin, xuya dibe, ya ku divê ew îtaetê nîşanî encama vî şerî bike. Malbat, naxwaze ku Esmeyê bidin Abbas ku ev yek ji Abbas hêrs dike. “Esmê nedane Abbas. Abbas ji bo Esmeyê sê kesan birîndar dike. ...Abbas sirgûnî girtîgeha Diyarbakîrê kirin” (28-29). Halil jî dil berdabû Esmeyê, lê Esmeyê ji wî hez nedikir. Halil bi zorê dest diavêje namûsa Esmeyê. “Halil, şevêkê bi şeş kesan va Esmê bi darê zorê ji mala bavê wê revand. ... Esmeyê li ber xwe da. Piştî hefteyekê, şerbetêke bi afyon bi Esmeyê va da vexwarin. Serê wê gêj bû û pir vereşîya. Ji xwe şerm kir. Xwîn nedisekîni (29).

Di romanê da astengkirina evîna dildaran rûdanê dide destpêkirinê, nivîskar bi rêbaza paşolanê rûdanan li hev girê dide û honaka rûdanê ya trajîk pêk tîne. Aristoteles, dîyar dike ku di berhemeke trajîk da divê vegera bextê ji wêranîyê ber bi bextewarîyê nebe, ji bextewarîyê ber bi wêranîyê be. Divê karakterê/a trajîk erênî û dilpak be ku vegera bextê, ne ji ber xerabîya karakteran, ji ber kêmasî û şaşîyekê pêk were (2017, rr. 44-47). Bi heman awayî Kemal di cureya romanê da bi astengkirina evîna dildaran û çalakîyên ku Abbas û Halil pêk tînin, vegera bextê ji bo wan saz dike. Esmê û Abbas wek karakterên erênî û xwedîyê evîndarîya bi bengîn hatine saz kirin ku dema evîn û evîndarîya wan tê astengkirin, ji bo wan vegera bextê pêk tê û ew ber bi wêranîyê va dixijîkin. Dema ku evîna Abbas tê astengkirin, lê dixê ji malbata Esmeyê çend kesan birîndar dike û dikeve girtîgehê. Piştîra ji bo xwe bigihîne dilberê ji girtîgehê direve û bi leşkeran ra dikeve pevçûnê. Esmê, tê tecawuzkirin û dibe hevîneke mecbûrî ya tecawuzkarê xwe, ango ya Halil. Ew rûdan ji bo wê travmayêke mezin dertîne

û salekê bi hîç awayî naaxive. Di zewaca wê da ya ku jê kêr e evîn e. Halil, Esmeyê bi revandinê û tecewizê bi dest dixê, piştra diçe nîkahê çêdike. Zagonên eşîrê destûra zewaca ku di encama tecewuzê da pêk tê, dide. Esmeyê, karaktereke lebat e ku radihêje xwe ji vê rewşê xelas bike, ku ew çend caran ji malê direve lê dîsa jî bi ser nakeve. Ji ber ku Abbas di girtîgehê da ye, têkilîya wan qut dibe. Herwiha piştî tecewizê têkilîya Esmeyê bi malbata wê ra jî qut dibe. Piştra, ew wek karaktereke neçar di kavilka mecbûrî da ya ku zagonên eşîrê jê ra ferz kirine rûdinê û li wir wek mirîyekê dijî. Dema ku zarokê wê tê dinê, ew bi hezkirina wî zarokî, xwe li jîyanê digire. Dildarê xwe yê girtîgehê ji bîr dike, ango dike ku ji bîr bike. Ew, xwe dide malbata xwe, têkilîyên germ bi gundîyan ra saz dike. Lê dema ku ew bi kurê xwe yê ku tê dinê, xwe bi jîyanê va digire, nizane ku yê di navbera hezkirina kurê xwe û zagonên civakê da bikeve nav rêbendî û berberîyekê.

Nivîskar, ji bo Esmeyê berberîyê xurt saz dike. Dema ku dildarê wê Abbas ji girtîgehê direve tê û li derdora wê digere, evîna dilê wê dîsa gur dibe. Ew, wek jîneke bi zewac û xwedîyê kurekî di navbera malbata xwe û evîna dilê xwe da dikeve nav berberîyekê. Esmeyê, pêşiyê radihêje ku dengê dilê xwe serkut bike. Ew, di heman demê da zagonên civakê tîne bîra dildarê xwe û dibêje, here yê me bikujin. Di Esmeyê da dil û hiş li dijî hev têdikoşin. Ew, li ber xwe dide, da ku di qada rewîştî da bimîne ya ku ji aliyê civakê va hatiye avakirin û deriyê xwe ji dilê xwe ra û ji Abbas ra digire. Lê dema ku Abbas diçe mehekê xuya nake, vê carê jî dixwaze wî bibîne, çavên wê li dildar digere. Tam jî di vê hingavê da berberîyê xurt a hundirîn ji bo Esmeyê rû dide.

Zewaca wê bi darê zorê be jî ew jîneke zewacî ye û divê dildarê xwe nebîne. Lê li dijî zagonên zewacê, evîn heye ku ew hevghêner e. Ji bo hevghênera wan astengiyên xurt, dîwarên mezin li pêş wan in. Hasan heye ku Esmeyê bêtî wî nikare bijî, herwiha zagonên eşîrê yê mirinbar hene ku li ser namûsê hatine kifşkirin. Malbateke Esmeyê heye ku Esmeyê êdî bi awayekî ew pejirandîye ku girêdayîna malbatê ji bo wê nirxeke rewîştî ye. Ev rewş, xwîneran kelecandî dike ka gelo Esmeyê yê çî bike û yê çî biqewime. Esmeyê, jîneke trajîk a di navberê da mayî ye. Ne destê wê ji malbata wê ya ku bi evîna kurê wê germ bûye dibe, ne jî ew dikare ji evînê û dildarê xwe yê Abbas bêpar be. Abbas di kuleke (şkeft) zinarên Anavarzayê da ye û Esmeyê xwe ber bi evîna dilî va berdide, du mehan bi dizî diçe wê kulê li cem dildarê xwe. Ev çalakîya ku Esmeyê dike, wek tevgerêke bêbextiyê û sûcek e ku li hemberî civakê kiriye. Nivîskar wê wek karaktereke li dijî civaka tecewizkar û neheq, cihûwar dike. Çalakîyê azad e ku Esmeyê vê çalakîyê bi vîna xwe ya azad, ji bo hestên evînê û nirxa evîndariyê dike. Lê ew bi vê çûyîna xwe, nirxên rewîştî civakê bînpê dike.

Di pergala civaka eşîrî da namûs û rûmeta malbatê nîş bi nîş tê veguhaztin ku ew wek nirxên berz li ser her tiştî tîne girtin. Di romanê da wek nirxeke bilind namûs û rûmeta malbatê ku ew girêdayî hev in, wêranker in. Jinên eşîrê bi van nirxan mezin dibin û zarokên xwe jî bi heman awayî mezin dikin. Di romanê da namûs li ser bedena jinê hatiye dîyarkirin ku mêtî malê venêrê vê namûsê ne. Jin namûsê, mêtî jî rûmetê temsîl dikin. Nivîskar li dijî nirxên namûs û rûmetê yê civaka eşîrê, hest û nirxeke xurt a gerdûnî bi cih dike ku ew jî evînê û hezkirin in. Evîn, hestêke xurt e û hîmeke giring a jîyanê ye. Girêdanî, dilsozî û sedeqatê dihevwîne. “Evîn, hêzeke karîger a hundirîn e ku dîwarên di navbera kesan da hene hildiweşîne, kesan digihîne hev. Evîn, hestên xwecihêgir û cudaker tîk dibe. Bi evînê, kes xwebûna xwe diparêze û timîya xwe wînda nake” (Fromm, 2023, r.42). Evîn jîyanê ava dike, carinan jî mirinbar e ew, bi taybet ji bo dildaran. Scheler, trajîkê di berberîya du nirxên bala û erênî da dibîne. Bi wî, ji bo ku rewşek bibe trajîk, di hengama berberîyê da divê nirxek ji holê rabe, nirxeke din jî bibe sedema jîholêrabûna vî nirxî (1919, r.252). Bi vî awayî rewşa trajîk, berberîya du tiştî, yan jî berberîya ku di yek kesî û yek tiştî da pêk tê îfade dike. Esmeyê, wek jînekê hem nirxên namûs û rûmetê dizane û hem jî ew wek evîndareke bi bengîn, dixwaze xwe bigihîne dildarê xwe û di encama vê da xwe di nav berberîyekê da dibîne. Bi vî awayî ev avaniya ku ji jinê ra nasnameyêke ku bi nirxên namûs û rûmetê pêk hatiye, ava kiriye, ji bo jina ku bi dilekî azad tevbigere dibe asteng ku nivîskar ji rewşa jina eşîrê, bi taybet ji jina Kurd tîgihîştîye û Esmeyê wek hilgira nasnameya trajîk ava kiriye. Ew, bi sazkirina

nasnameya trajîk a jinê û rewşa trajîk a pê va dixijike, balê dikişîne jina Kurd a ku di sedsala 20em da bi rewşên trajîk va dixijikin, herwiha jinên ji neteweyên din, yên hê jî dibin qurbanên zagonên civakê. Herwiha nivîskar bi vê sazkirina rewşa trajîk, nasnameya jinê ya ku bi hişmendîya nêr va hatiye sazkirin tîne rojevê, pirsgirêka jinê ya hemû jinên stembar yên cihanê bi bîr dixê.

Berberî, çalakîyekê hewce dike. Divê karakter ber bi alîyekî va çalakîyekê bike û xwe ji berberîyê xelas bike. Di çalakîya meriv da karakter û hîlbijartinên wî xwe nîşan didin. Leheng, bi hîlbijartin û çalakîyê, dibe lehengê trajîk. Herwiha, “pêkanîna çalakîya trajîk û kişandina eşê, di aferîşa karakterê trajîk da heye” (Scheler, 2008, r.240) ku bi çûyîna cem Abbas, Esmê çalakîyekê pêk tîne. Bi vê çalakîyê ew nîrxên namûs û rûmeta malbatê binpê dike û evîn û evîndarîyê berz dike, lê yê ber bi wêranîya trajîk va bixijike. Piştî vê rûdanê di navbera Abbas û Halil da gijgijînek xurt dest pê dike. Rojê di zinarên Anavarzayê da pevçûnek diqewime, Halil birîndar dibe. Cerahe Kurd wî derman dike. Di dawîyê da Abbas bi ser mala Halil da digire. “Şevêk bû, di sifreyê erdê da bav, dê û kur tev xurek dixwarin... Dengê guleyan hawirdorê serûbînî hev kirin... Dema ku Hasan li ser xwe va hat... Xwîn dît. Bavê wî deverû ketibû ser sifreyê... Ji bavê wî, pir xwîn dihat, wek fizikandinê” (Kemal, 2021, r.13). Li ser vê rûdanê xizmên Halil, Abbas dikujin û laşê wî diavêjin ber kuçikan. Nojdar tê laşê Abbas parçeparçe dike û paşê didûrî. Hasan ji ber vê dîmenê, lê ye vereşe. Birayên Halil Esmeyê dikşînin tînin ber laşê Abbas. “Were bibîne oruspî, were bibîne...” ... “Di çi halî da ne dostê te, pêzevengê te, were bibîne” (15). Dêya Halil got: “Kujerê kurê min kafîrê Abbas nîne, kujerê kurê min Esmê ye.” ... “Xwe bigihînin, paqijkin xwîna xwe” (16). Gund, gundî dibin dijminê Esmeyê. Tûndîyeke fizîkî û derûnî li ser Esmeyê pêk tînin.

Tevgera Esmeyê wek bînamûsîyekê tê nîşandan, herwiha ew ji alîyê malbata Halil û civakê va wek kujerê Halil tê nîşandan. Lê di bîngeha rêzerûdanan da, herwiha çalakîyên karakteran da hêmanên derûnî û civakî hene. Şaşîya ku ji alîyê Halil va hatiye kirin a tecewîzê, ji alîyê civakê va nehatiye cezakirin, lê çûyîna Esmeyê li cem Abbas ku ew dildarê wê yê rast e, ku ew çûyîn ji bo Esmeyê rast be jî, anegorî zagonên civakê sûcek e. Tevgera Esmeyê ji bo sedsala 20em û nîrxên namûs û rûmetê ya civaka eşîrê, li dervayê rewîştê be jî dibe ku ji bo serdemên din bi taybet yên dahatûyê asayî be jî. Derbarê vê da Scheler, di ya trajîkê da li ser hêmana rewîştê radiweste û dibêje, merivê/a ku dikeve nav çalakîyê da, heke ji nîrx û dilpakîya (*ethos*) dema ku tê da ye, derbastir bibe, çalakîya ku dike dibe ku anegorî nîrx û dilpakîya serdema wî/ê xerab be jî, ji ber ku ev kes yekem car ji nîrxê bala tîdigihîje, dibe ku çalakîya wî/wê baştir be. Ew, di qada nîrxan da pêşvaçûnê pêk tîne, lê ji alîyê nîrxê heyî va, dikare wek kesekî/e ji alîyê rewîştê va jêr û lawaz were nîrxandin û bi vê jî dikare were darizandin. Ew dibêje, di dîrokê da guherîna mezin a nîrxekî, serdema wê ya derbasîyê, ji alîyê hêmana trajîk a ku di xwe da pêşvaçûna rewîştî dihevine, wekî mecbûrî, bi gelek kesên ku hatine qurbankirin va dagirtî ye (Scheler, 1973, r.300, vgz. Kaya, 2012, r.55). Esmê wek jîneke eşîrê ji ya bala, ku ew evîn, evîndarî û hezkirin e, tîdigihîje, lê ew di serdema xwe da ji nîrx û dilpakîya (*ethos*) dema ku tê da ye, derbastir dibe lewma dibe qurbanîya wê demê.

Mar di mîtolojîyê da ajaleke giring e û motîfeke sereke ya berhemên wêjeyê ye. Taybetîyeke marê ew e ku hebûna wê, di merivan da rageşîyê dertîne û kuştina wê pir dijwar e. Dema ku ew tê kuştinê rageşî ji holê radibe. Nivîskar di navê romanê da wek sembolekê, mar bi kar anîye û wê wek hêmana rageşîyê saz kiriye. Di romana *Yılanı Öldürseler* (Marê Bikuştina) da mara romanê Esmê ye. Ew, dewa kuştina Esmeyê dikin ku bi kuştina wê yê cihê rageşîyê aramî bigire. Ji ber vê taybetîya marê ew tê hîlbijartin. Em di vê civakê da dibînin ku jîneke bedew û dilpak, ne ji ber xerabîya dilê xwe, ji ber hest û nîrxên evîn û evîndarîyê, ji alîyê civakê va bi mareke ku divê were kuştin va tê veguherandin.

Esmê, laşê dildarê xwe, yê ku avêtibûn ber kuçikan, radike dibe dide axê. Esmê bi vê çalakîyê li dijî zagonên civakê tevdiqere ku ji vî hêlî va çalakîya wê dişibe çalakîya karaktera bi navê Antîgone ku ew karaktereke trajîk a klasîk a serdema Yewnana Pêşîn e. Zagonên eşîrî û kevneşopên civaka feodal

gef jê dixwarin û digotine wê, ji gund derkeve here lê tu nikarî kurê xwe bi xwe ra bibî, ku Esmê li dijî vê helwestê çend caran kurê xwe hilda ku ji gund derkeve, lê bi her carî kurê wê ji destê wê hildan û ew jî li pey kurê xwe, vegeftiya kavilka xwe. Xwesîya Esmeyê, ji kurên xwe dixwaze ku wê bikujin. Mustafayê birayê Halil ji Esmeyê ra dibêje: “Tu gunehê te tune xwîşka min.” ... “Dîsa jî tu nesekine here. Yê te bikujin xwîşka min. Çima ku ez te nakujim, dêya min bi min ra naaxive. ...di vê malê da dêya min te sax nahêle. Here ji vir xwîşka min. ...xwînê birije...” (Kemal, 2021, r.35-36). Mustafa jê daxwaz dike ku ji wir bireve here da ku neyê kuştinê. Lê ger neçe, her kesek ji kur û xizmen dayikê, dibe ku wê bikujin. Ew, dibêje: “Rûpela mirina te di stûyê te da daliqîye. Ger tu kes te nekuje, dêya min yê te bi kurê te Hasan bide kuştinê...” (36). Esmê çûyîne dipejirîne lê ne tenê. Ew dixwaze bi kurê xwe va tev herin. Di navbera Mustafa û Esmeyê da li ser çûyîne axavtineke wiha derbaz dibe: Mustafa: “Nabe. Tu nikarî Hasan bibî.” Esmeyê got: “Bêyî kurê xwe ez nikarim herim tu derî. Ez nikarim ji wî veqetim” (36). Mixabin rewşa li holê û zagonên civakê derfet nadin ku ew kurê xwe li gel xwe bibe. Mustafa dibêje: “Tu dizanî tu yê bimirî. ...tu ne guneh î, hê pir ciwan î. ...ez ji te ra bêjim, jîyana te li vir hindik ma. ...Ji rûyê te em nikarin derkevin nav merivan. ...Ger tu nemirî, kuçik jî li rûyê me nanihêrin” (36). Bi vî awayî Esmê wek qurbanekê hatiye dîyarkirin, qurbana ku bi kuştina wê, civakê xwe ji gunehan paqij bike, namûs û rûmeta malbatê dê bê parastin.

Her kesî dizanî ku yê Esmeyê bikujin. Esmeyê jî dizanî. Lê ya ku nadihate zanîn, gelo kê yê Esmê bikuşt. Ya ku ji daxwaz û axavtînen birayên Halil tê dîtin li pêşîya Esmeyê du rê hene. Ew, kurê wê û canê wê datînin pêşîya wê. Bi vî awayî nivîskar careke din ji bo Esmeyê berberîyekê saz dike. “Ya trajîk bixwe jî nirxeke bedew, kirêt, baş û xirab nîne. Di tişt û merivan da, bes bi navbeynkarîya nixên wan derdikeve der” (Scheler, 1919, r.244) ku trajîk bi xwe nix nîne, qewimînek e û di encama berberîya nixan da der dibe. Leheng, bi hilibjartin û di encama çalakîyê da dibe lehengê trajîk. “Pêkanîna çalakîya trajîk û kişandina êşê, di aferîşa karakterê trajîk da heye” (240). Esmê wek karakter di aferîşa xwe da puxta trajîk dihewîne. Ew ji bo êşkişandin û wêranîyê amade ye. Karaktera trajîk ew karakter e ku di navberê da maye. Esmê, heke canê xwe hilibjêre yê kurê xwe wînda bike, lê ger kurê xwe hilibjêre û li gel kurê xwe li gund bimîne, vê carê yê ji canê xwe bibe. Ew, di rewşa hilibjartina mecbûrî da ye. Karakterê/a trajîk ew karakter e ku di navbera du nixên erênî da hilibjartinekê dike û çalakîya xwe pêk tîne. Çalakîya xwe ber bi kîjan alî va bike, yê alîyê din wînda bike. Lewra, di trajîkê da dema ku nixek tê hilibjartin, ya din ji holê radiibe. Belê ew ê hilibjartineke azad bike lê ev hilibjartin li ser vîna azadîya wê ye. Lewra ev hilibjartineke mecbûrî ye. Ev rewşa trajîk ew rastîya meriv e ku meriv bi hîç awayî naxwaze bikeve rewşeke bi vî rengî, her wiha ew tirsna û eşdar e. Esmê, ji gund dernakeve naçe. Di navbera canê xwe û kurê xwe da kurê xwe hildibijêre. Hilibjartina xwe dike û ew ê heta mirina xwe, yê jîyana xwe bi kurê xwe ra derbaz bike.

Nivîskar ji bo ku karîgerîya trajîk pêk bîne ji tirs û tûndîyê sûd werdigire. Hasan ê kurê Esmeyê hê piçûk e lê ew ji rewşê têdigihîje. “Hasan axavtînen di navbera ap û dêya xwe dibihîze. Hasan saw ji Mustafa digire. Ew, dizane ku dêya wî yê were kuştinê. Ji ber ku apê wî Mustafa qencîya dêya wî dixwaze, ji apê xwe hez dike. Wî dixwast ku dêya xwe xelas bike” (Kemal, 2021, rr. 35-37). Esmê, bi derûnîyekê xerab dijî. “Tirsê serdanpê ew wergirtibû” (37). Ji tirsê Hasan jî bêpar namîne. “Şevêkê sê heb dikevin malê û guleyan direşînin. Ji ber ku Esmê ne di mal da ye, ew difilite. Hasan ji tirsê xwe tê xwe dixwe kuncikekê, lê mêrikek ku wî dibîne, peyînekî li dil û hinavê wî dixwe û yê din jî li Hasan dixin, çêran li wî dikin” (37). Pîrika Hasan ji hersê kurên xwe daxwaz dike ku Esmeyê bikujin lê ew ji ber hin hincetan, nikarin bikujin. Ew dîsa rojekê direvin, lê sîyarî li pey wan dikevin. Esmeyê digirin diavêjin navbera xwe û bi qirbaçan lê dixin. Hasan tab nake, ji ew cihê ku xwe lê veşartîye derdikeve, “...ji erdê kevîran berhev dike û diavêje sîyarîyan. Hem diqîrîya û hem jî hesp didan ber kevîran. ... “Axxx” digot Hasan, xwezî min tîfinga xwe hilda, min ê ew hemû bêcan raxistana erdê” (42). Di dawîyê da xwesûya Esmeyê, ne dikare Esmeyê bi kurên xwe bide kuştinê, ne jî birayên wê yê çiyayî dikarin Esmeyê bikujin. Ew, hêvîya xwe bi Hasan va girêdide, radihêje Esmeyê bi Hasan bide kuştinê.

Ev rahiştina wê, çend sal didome. Pîrik, ap û gundî li pêşîya Hasan çêra li dêya wî dikin. Sîyarî jê ra dibêjin: “Ji dêya oruspî, deyûsê wiha tê dinê” (44). Hasan di berberîya ku di navbera dê û pîrik û apan da ew li alîgirê dêya xwe ye û ew piştgirî dide dêya xwe. Hasan ji dayika xwe hez dike, ji ber vê hezkirinê li dij kuştina dêya xwe ye. Ji bo tolhildanê ya ku herî zêde agir gur dike pîrika Hasan e. Pîrik dibêje: “Dest û pêyên vê kuçikê girêdin” (45). Pîrika Hasan, apên wî û gundî radihêjin ku Hasan bikin dijminê dêya wî. Di gund da, derbarê xortlaktîya Halil da gotegotên cihêreng balav dibin. Ji Hasan di hate xwestin ku dêya xwe bikuje, bavê xwe yê xortlak, yê ku dikeve dirûvê her cure ajelan û li der û dorê digere, xelas bike. Dawîya hemû gotegotan yê derbarê Halil, hemû dihatin li Hasan dialîyan. “Hasan tişteki pir kirêt kiriye, dê bû, belê dê bû, lê yê ku di rîyê wê da ji gorê derketiye, ketiye halê nebûyî jî bav e” (53). Ji Hasan dixwastin ku tola bavê xwe wergire û bavê xwe ji wê êş û janê xelas bike. Yek ji wan gundiyan jî ji Hasan ra dibêje: “Dêya xwe nekuje,” ... “Ew e ku Xwedê di hezar salî da bi hunera xwe çekiriye ...li ber bayê bavê xwe yê xortlak û Kerimê keçel nekeve, nekuje dêya xwe. Bêje dêya xwe, bira ew jî li ber bayê van gundiyan ku dîn bûne nekeve, xwe nekuje” (56). Hasan jî bedewîya dêya xwe dieciband, “...porên wê dirêj bûn, çilkezî bûn, di kezîyên wê da nexşên zêr, zîv û mircan hebûn. ...Ew wisa sekinî, bi heyranî li dêya xwe nihêrî” (60). Kürt Sülo jî dibêje wî: “Min bihîstiye ku apên te dixwazin ku dêya te bikujin lê tu nahêlî. Dibêjin dêya te, bavê te daye kuştinê, lê bawer neke, li pey her keseke bedew wisa tê gotinê. Dêya te ji maleke malmezî e” (61).

Bi vî awayî, nivîskar bes ne ji bo Esmeyê, di heman demê da ji bo Hasanê kurê wê jî berberîyekê saz dike. Hasan, hinek din mezin dibe. Pîrika wî dinihêre xizmên wî yê çîyayî nikarin Esmeyê bikujin. Herwiha kurên wê jî him ji ber bedewîya Esmeyê qêmiş nakin wê bikujin, him jî ji birayên Esmeyê ditirsin, ew giranî dide ser Hasan, ku Esmeyê bi kurê wê bide kuştinê. Gundî, li ser xortlaktîya Halil gotegotan belav dikin û êdî gelek kes ji wan gotegotan bawer dikin. “Esme, Esme,” ... “Halil bûye xortlak. Di gund da yê ku nedîtî nemaye... Xwîna xwe ya ku li erdê maye dixwaze. Xwîna Halil bidinê” (51). Êdî demek tê gotinên dapîr, ap û gundiyan bandorê li ser Hasan dikin. Hasan jî ji xortlaktîya bavê xwe bawer dike û ji dêya xwe ra dibêje: “Bavê min xortlak e, apê min dîtîye, gund gundîtî, dîtine” (50). Hasan êdî di nav berberî û rageşîyêke giran da ye. Dike ku xwe ji wan xelas bike. Ew, ji gund direve, li pey çareserîyekê dikeve, diçe gundekî dûr dimîne û li pey xalanên xwe dikeve, lê wan nabîne. Hasan dikeve nav xeyal û hestên tevlihev. Dêya Hasan tê bîra wî. Dilê wî ditengîje. Dêya xwe di wê dojhê da di devê mirinê da hiştiye û revîye. Meriv hiç wisa dike. Dikeve nav fikr û hestên tevlihev. Demek tê ew gotegotên gund, nîrx û zagonên civakê werdigire, ji wan bawer dike, wek rastî û nîrxekî wan dihevwîne. Ew, êdî dibe hilgirê nîrx, zagon û bawerîyên civakê. “Divê dêya min were kuştinê. ...ger ew neye kuştinê nabe. Li Çukurovayê kes li rûyê me nanihêre. ...Bavê min jî wek marekî xişxişok, di germîya Çukurovayê da digere û dişewite... Divê ew bimire... Divê Esme bimire. Esme yê bimire” (68). Lê dîsa ji hezkirina dêya xwe û bêgunehîya wê difikire. “Ew, bi rojan li ser vê fikirîbû. Çi ramaneke xirab. Hiç meriv mirina dêya xwe dixwaze? Ger dêya wî bavê wî kuştibe. Û bavê wî jî ji ber xwîna xwe ya li erdê mayî ji gorê derketibe û bûbe xortlak. ...Çi dijminatîya pîrika wî bi dêya wî hebe. Ew, dike ku kurê xwe xelas bike” (68). Roman demekê li ser berberîya Hasan radiweste. “Esme, ji bo xwe heman tiştî yê neke? Ez ê ji bo bavê xwe wisa nekim? ...girîya. Ji girîna dilê wî diperitî. ... Dibe ku dêya wî kuştibûn... Di hundirê wî da şabûnek... Paşê jî hê pêlên şabûnê radibûn, di hundirê wî da êşek, janeke giran di dilê wî da” (68). Hasan li hev diçe û tê ku nivîskar bi vê rageşî û meraqek pêk tîne. Ev rageşî bandor li xwîneran jî dike ku bi çalakîya mecbûrî ya Hasan, rageşîya xwîneran jî yê vala be.

Li alîyekî pîrik, ap û xwîna bavê wî, li alîyê din dêya wî, hezkirina dayikê. Ew di navbera herdu alîyan da diçe û tê. Gotegotên gundiyan carîna radiweste lê carînan jî mîna pêlên avê radibin. Hasan diçe nav gundiyan û êdî ew jî dixwaze derbarê dê û bavê xwe da gotegotan bibihîze. Ew, rojekê direve derdikeye pêşîya pîrik û apên xwe dibêje. “Ez çûm, ...ez revîm ji vî cihê lenet. Ji ber we ez revîm. Min ne bavê xwe dît ne jî tişteke din. Derew, derew... Hûn hemû derewan dikin” (69). Heta ku pîrika

wî li ser namûsa dêya wî radiweste, Hasan dêya xwe diparêze. Ew, derbarê Esmeyê da dibêje: “Êdî tu mezin bûyî, dêya egîdekî mîna te çawa dibe mêrekî din hildide nav cîyê xwe. Dêya te her roj mêrekî hildide nav cîyê xwe. Gundî hemû vê yekê dizanin. Dêya te bedewtirîna cîhanê ye. Kes qêmîşê wê nake ku bikuje. Xwîna bavê te li erdê ma” (93). Ev gotinên dapîrê li cem Hasan nîrxê namûs û rûmetê, herwiha hestê dexesîyê dilivîne. Dapîr didomîne: “Tu yê di vê cîhanê da çawa li çavên xelkê binihêrî? Heta mirinê yê ji te ra nebêjin kurê oruspîyê? Tu yê tenîya rûyê xwe çawa paqij bikî? Rûyê Hasan bibû mîna rûyê mirîyêkî” (93-94). Gotinên pîrikê di nav gund da belav dibe. Gundî jî lê zêde dikin û gotegot bi awayên cihêreng belav dibin. “Oruspîtiya dêya wî jî Hasan nekuje, di wî da xwîn tune. Esmeyê mîran hildide nav cîyê xwe, Hasan jî temaşa dike û kêfxweş dibe” (95). Hasan van hemûyan guhdar dike, gotegot mîna kevîrên tûj li ser Hasan dibarin. “Ma Hasan ne mîr e, ka bira bibîne dayîka xwe bi yekî din ra... Yê dêya xwe jî bikuje, mîrikê li ser wê jî” (96). Hasan “direve derdikeve li ser zinar û birekên tûj, piştra vedigere tê gund. Diçe û tê, dema ku dêya xwe dibîne, wek dîna ditirse, diricife, ji xwe diçe, lê dema ku ji wê diqete xwe di valahîyekê da dibîne” (100). Kemal, berberîya trajîk a ku di hundirê Hasan da diqewime, bi awayekî serkevtî û bi têra xwe dişayesîne. Hasan di nav rêbendîyê xurt da ye û li pey çareserîyê ye. Lê di ya trajîkê da cîyê çareserîyê tune. Yanê Hasan ne dikare dêya xwe bikuje ku vê wek çareserî nabîne, ne jî dikare bi zagon û gotegotên civakê, nîrx, namûs, rûmet, tol û hestên mîranîyê ra serederîyê bike yên ku di hundirê wî da bi wate û nîrxdar bûne. Di honaka rûdanê ya trajîk da cihê herî karîger ev hingav e, ya ku girê dibişkive û karakterê trajîk çalakîya xwe pêk tîne û xwe ji rêbendîyê xelas dike. Hasan tê li ber dêya xwe disekîne û çalakîya trajîk pêk tîne. “Dêya Hasan li ber tendurê xwarî tendûrê dibe û radibe. Di destê Hasan da çeka bavê wî heye. Bi dengê guleyê qêrînek rabû. Li ser hev gule teqîyan. Esmeyê kete tendûrê û bêhna şewatê hawîrdor vegirt” (101).

Bi vî awayî rewşa trajîk a Esmeyê û Hasan bi wêranîyêkê bi encam dibe. Esmeyê di navbera kurê xwe û canê xwe da kurê xwe hildibijêre û evîna kûr berz dike. Hasan jî di navbera nîrx û zagonên civakê û dêya xwe da nîrxên namûs û rûmetê ya civaka eşîrê, herwiha zagonên wê civakê berz dike. Di vê rûdana trajîk da sîcek dertê. Kuçuradi dibêje, “di rûdana trajîk da sîcek heye lê sîcdarê vî sîcî tune (2009, r.20). “Heke ji bo pîrsa sîcdar kî ye, bersiveke zelal hebe, di wir da rengê yê ku trajîk e kême” (Scheler, 1919, r.260). Di rewşa trajîk da her kesî sparteka xwe, ya ku divê were kirin kiribe jî, sîcek li holê dimîne; lê ji ber ku ew sîc jênerê e, ew nikare bi cihêkî va were bicihkirin (Kuçuradi, 2009, r.20). Bi vî awayî meriv, dema ku xwe di berberîyêkê da dibîne û çalakîya mecbûrî pêk tîne, dema ku alîyêkî berberîyê berz dike, alîyê din ew nexwaze jî ji holê radibe, ji ber vê jî ew nikarin wî/ wê rasterast sîcdar bikin, ew kes hem sîcdar e û hem jî bêsîc e. Esmeyê kuştin heq nedikir û Hasanê kurê wê jî kujerîyê. Ma kîjan zarok dixwaze dayîka ku jê hez dike bikuje. Hasan dêya xwe diparast ku ew neyê eşandinê û kuştinê. Lê ya trajîk bi ya xwe kir. Trajîk wêranî û eşê dihevine ku meriv tucar naxwaze bikeve rewşeke trajîk. Vê gavê gelo meriv nikare pêşîya trajîkê bigire, yan jî dema ku kete rewşa trajîk, xwe jê xelas bike? Scheler (1919, r.257) tîne ziman ku pêşîya trajîkê nikare were girtin û ew taybetîyê mecbûrî dihevine. Meriv bi hemû vîna xwe tevbigere jî ew ê bi ya xwe bike.

Ev deqa ku bi bobelatekê va xilas dibe, eş û tîrsekê di xwîneran da peyda dike. Tîrs û dilşewatî hêmanên giring yên honakên trajîk in. “Em ji ber eşa ku yê/a din dikîşîne bertekê nîşan didin û dilê me dişewite. Tê dîtîna ku tiştêya (*obje*) eşê, eşa yên din in. Ji ber bextreşîyêkê eşê dikîşînin. Ji ber ku ew bi timî bêsîc in, yan jî bisîc in, lê cazeya ku dîtîne, ji cezayê ku heq dikirin gelek zêdetir e û ew bextreşî yê rojek were me jî bibîne, em bi vê tîrsê pê diêşîn (Yiğit, 2008, r.166). Ramana Nietzsche ya derbarê trajîkê da ev e ku hilşandina demê bi tragedyayê nayê rastkirin, yan jî telafîkirin, bes ew tê fehmkirin. Ya trajîk, ji bo eşa hebûnê nabe derman, tenê hêz û kûrahîya vê eşê bi her kesî va dide nasîn (Dienstag, 2008, r.138). Em bi vê deqa trajîk ji rewşa trajîk a meriv, herwiha ji eşa meriv têdigihîjin, çawa ku Bonnard (2006, r.11) tîne zimên, “tragedya, jê tîgihîştina hişmendîya eşa merivayîyê ye”, ev deq jî ji eşa merivayîyê mînakekê pêşkeş dike.

Encam

Kemal, bi karîgerîya şert û mercên sedsala 20em ku di wê serdemê da ew şahidîya demajoya guherîn û veguherînan dike, vê berhemê dinivîse. Ew, berê xwe dide nîrx û zagonên civakên ku koçê Çukurovayê bûne, li ser berberîya merivên vê civakê hûr dibe ku beşeke giring a vê civakê Kurd in. Ew, berê xwe dide rûdaneke trajîk a ku hatiye jîyîn, wê diguherîne, vediguherîne û ji nû va dihûne. Ew di vê romanê da li ser nasnameya eşîrê hûr dibe. Ev nasname ji aliyê civaka nêr a eşîrê va hatiye avakirin. Jina hilgirê vê nasnameyê ne azad e û a ku ji wê tê xwestin îtaet e. Bi vî awayî nivîskar li ser merivên eşîrê yên ku bi nîrx û zagonên civaka eşîrê hatine dorpêçkirin radiweste. Nivîskar, di romanê da vê nîşan dide ku dema jina hilgirê nasnameya eşîrê, daxwaz dike bi dil û vîna xwe tevbigere, rastî nîrx û zagonên civakê tê û wêran dibe. Herwiha, ew li ser jineke ku qurbanîya zagon, kevneşopî û baweriyên mîtîk a civakeke eşîrê ye, hûr dibe. Di romanê da tê dîtîn ku jina eşîrê li hemberê canê xwe, li dijî civaka tûndker tevbigere û hezkirinê berz dike. Mêrê eşîrê jî di navbera nîrx û zagonên civakê û hezkirîya xwe da dikeve nav berberîyekê û di encamê da hezkirîya xwe dike ku bi vê çalakîyê, zagon û nîrxên civakê berz dike. Herwiha, nivîskar di romanê da nakokîyên rewîştî yên vê civakê radixe ber çavan. Civakeke ku xwedîyê nasnameyê nêr e, bi rijandina xwîna jineke bê guneh, dike ku xwe paqij bike, tê vegotin. Ev deq, hem rewşa trajîk bi xwîneran dide têgihîştinê, hem jî rexneya civakekê û serdemê dike û balê dikişîne ser pîrsgirêkên domdar yên jinê.

Nivîskar bi vê romanê di edebîyata Tirkî da hem rewşa trajîk a jîyanê dide nîşan, hem jî rewşa trajîk a civak û merivên eşîrê yên sedsala 20em, bi taybet a civak û merivên Kurd, nîşan dide. Di bergeha trajîkê da wateya hebûnê bi êşê xwe dide nîşan ku nivîskar bi vê romanê, bi êş û wêranîya meriv û civaka eşîr, têgihîştinek ji êşa merivayetiya pêk tîne.

EXTENDED ABSTRACT

Yasar Kemal spends most of his life in the 20th century and remains under the influence of the conditions of the 20th century. He faces the difficult problems of this century, understanding the tragic situation of society and the people of this century from the developments and changes of this century. The tragic situation is hidden in the abstract of the universe, where art has long helped people to understand the tragic state of life. Kemal understands the tragic situation of life as an artist and shows it in his texts. He starts from a real event with the help of language, transforms that incident with imaginary power and announces it with the novel *Yılamı Öldürseler*.

In the novel, the atmosphere of the works of tragedy is seen. The author considers a scary animal for the name of the novel which brings out a statement with its existence. In the novel, like the tragedies of The Antique Greece, which rely on myths and events that are important to today's people, myths and events are included. It also remembers the harmonious rumors of the villagers, the chorus of tragedy. The novel society is a tribal community that Kemal shows the tragic situation of this novel in the relationships, laws, and values of this society. Kurds are also an important part of the community that they migrated to Cukurova region. It is clear that they have also brought with them the values and laws of the Kurdish tribal system. They live in a way with traditional values and laws.

In setting up the tragic situation like tragedies elements, Kemal uses resistance, brigandage, action, destruction, and pain. In the novel, both a common and individual rivalry is seen. It establishes a strong rivalry between individuals and society and builds the basis for the tragic situation. He describes his tragic characters as benign, loyal and valued people. It also establishes the identity of its characters within the tribal gender system and puts them in a conflict between the values and laws of society, their individual feelings and attitudes. Also, with the return of happiness, he puts his characters on a path that is impossible to return. In this novel, those who represent the male identity of the tribe are the reviewers of the values and laws of society.

The woman of the novel is also the bearer of the women's identity of the tribe and is surrounded by the laws of traditional society. Kemal presents the character of Esmé and her son Hasan as tragic characters in this tribal community who represent the men and women of the tribe, who are in obstacles and are moving towards a tragic situation. Just as it is the return of happiness from joy to destruction in tragic hoaxes, he leads his characters from joy and tranquility to destruction. In the novel, Kemal illustrates the tragic situation of the tribe's man, who is in conflict between the laws of society and his feelings, and ultimately raises the values and laws of the tribal community. It also presents the tragic situation of the tribal woman who is devastated when she acts against the power of society with her attitudes and actions. On the one hand, this novel gives readers an understanding of the tragic state of life, on the other hand, it presents the tragic situation of people and communities that carry tribal values and are surrounded by tribal law.

Çavkanî /References

- Akbayır, S. (2018). *Âşık kemal, bohem orhan*. (3. Baskı). Lim.
- Alakom, R. (2013). *Yaşar kemal'in yapıtlarında kürtler*. (2. Baskı). Avesta.
- Aristoteles. (2017). *Poetika*, (14. Baskı). (Çev. Samih Firat). Can Sanat.
- Auerbach, E. (2019). *Mimesis batı edebiyatında gerçekçiliğin tasviri*, (Çev. Herdem Belen, Hüseyin Ertürk). İthaki.
- Bonnard, A. (2006). *İnsan ve tragedya*. (2. Baskı). (Çev. Yaşar Atan). Evrensel Basım Yayın.
- Çiftlikçi, R. (1993). *Yaşar kemal yazar-eser-üslup*, (Doktora Tezi). İnönü Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Eğitim Anabilim Dalı.
- Dienstag, J. F. (2008). Tragedya, Pesimizm, Nietzsche. *Cogito*, (54), 133-143
- Eagleton, T. (2012). *Tatlı şiddet trajik kavramı*. Ayrıntı.
- Fromm, E. (2023). *Sevme sanatı*. (11. Baskı). (Çev. Işıtan Gündüz) Say Yayınları.
- Göbenli, M. (2021). Karşılaştırmalı edebiyat alanında örnek bir çalışma: Erich auerbach, mimesis: Batı edebiyatında gerçekçiliğin tasviri. dnd. (Ed. Ferzane Devletabadi, Arzu Yetim, Veysel Lidar) *Kurumdan Uygulamaya Karşılaştırmalı Edebiyat Çalışmaları I*. (s. 61-68). Akçağ Yayınları.
- Kaya, E. Ü. (2012). *Unamuno ve scheler'de trajik kavramı*. (Doktora Tezi). Maltepe Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe Ana Bilim Dalı.
- Kemal, Y. (2021). *Yılanı Öldürseler*. (36. Baskı). Yapı Kredi Yayınları.
- Kemal, Y. (2019). *Yaşar kemal kendini anlatıyor: Alain bosquet ile yaşar görüşmeler* (9. Baskı). Yapı Kredi Yayınları.
- Kemal, Y. (2008). *Filler sultanı ve kırmızı sakallı topal karınca*. (7. Baskı). Yapı Kredi Yayınları.
- Kuçuradi, İ. (2009). *Sanata felsefeyle bakmak*. (4. Baskı). Türkiye Felsefe Kurumu.
- Metin, A. (2011). Kimliğin toplumsal inşası ve geleneksel kadın kimliğinin aktarımı. Çankırı Karatekin Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, 2 (1). 74-92.
- Paksoy, B. K. (2011). *Tragedya ve siyaset eski yunan'da tragedyanın siyasal rolü*. Mitos Boyut Yayınları.
- Sağlık, Ş. (1998). *Popüler roman ve estetik roman kavramları açısından esat mahmut karakurt ile ahmet hamdi tanpınar'ın romanları üzerine mukâyeseli bir çalışma*. (Yayımlanmamış Doktora Tezi). Ondokuz Mayıs Üniversitesi Sos. Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.
- Saklıyan, M. (2019), *Yaşar kemal "çukurovadan dünyaya"*. Gerekli Kitaplar.
- Scheler, M. (1919), *Vom umsturz der werte der abhandlungen und aufsätze zweite durchgesehene auflage*. Der Neue Geist.
- Scheler, M. (2008), Trajîk görüngüsü üzerine, *Cogito*, (54). 237-245.